

Jina serhildêr

Meyan Xatûn

• Berjin TEKÖŞER

Jinên Êzîdî di her serdemekê de, ji bo ku bikaribin xwe biparêzin, li hemberî êrîşên qirkirin, tunekirin û têkbirina civak û çanda xwe a Êzdayetî bisekinin, berxwe dane û serî hildane. Yek ji wan jinan jî Meyan Xatûn e.

Helbet wê jî wek gelek jinên Êzîdî, di dem û cihên cûda de ji civaka xwe re pêşengî kiriye, ew birêve birine û bûye xwedî hêza siyasî û civakî. Bê guman di civaka Êzîdî de gelek şêre jinên wiha ku ji bo parastina dîrok û nîrxên civaka xwe têkoşiyane, hene. Eysa Dîz û Gula Şemê jî yek ji wan jinan in.

Jineke polîtîk û xwedî hêz bû

Meyan Xatûn bi eslê xwe Êzîdî ye û keça Evdî Beg e. Ew di sedsala 19'an de jiyaye. Di serdema ku Mîr Hisên Beg ê birayê Evdî Beg ji aliyê Osmaniyan ve hatibû bê erk kirin, Evdî Beg tevahiya civaka Êzîdîyan birêve dibe û ji wan re mîrtiyê dibe.

Malbata Meyan Xatûnê êş û komkujiyên ku bi serê Êzîdîyan de hatiye, keder û zextên ku ji ber bawerîya xwe jiyane, yek û yek jê re behş kirine. Ew di derbarê serpêhatiya xwe de xwedî agahî ye û ligor wê tevdiqere. Ew di sala 1874'an de li gundê Baedrê ya başurê Kurdistanê tê dinyayê. Li gor ol û bawerîya xwe a Êzdayetî tê mezin kirin. Di hejde saliya xwe de bi Mîr Elî beg re dizewice. Li gorî wê çandê, çanda Melekê Tawûs a ku zanî û zelaliyê esas digire û azadixwaze, tê mezin kirin. Êzîdî xwedî bawerî û çandeke zanyarî, azadixwazî û serhildêr in. Ji ber van taybetmendiyên ola xwe, her tim hewldane ziman û çanda xwe biparêzin.

Meyan Xatûn jineke polîtîk û xwedî hêzeke ramanî bû. Ew di salên 50'î yê sedsala borî de bi roleke girîng radibe û di parastina hebûna gelê Kurd de rol dilîze. Nemaze dema ku dewleta Osmanî Kurdên Êzîdî neçarê koça bi darê zorê an jî guhertina ol dikin, Meyan Xatûn li hemberî van êrîşan derdikeve û roleke girîng dilîze. Ji xwe dema Mîr Elî Begê hevserê wê dimire, ew rêveberîya eşîrê digire dest xwe û birêve dibe. A rast ne tenê eşîr û êlên Êzîdî, herêmê birêve dibe.

Bi edaleta xwe tê nasîn

Meyan Xatûn di rêvebirinê de bi edalet û wekhev nêz dibe, ev yekahî jî bandoreke mezin li ser gelê herêmê dide çêkirin. Ev nêzikatiya wê dihêle ku di demeke pîr kin de rêveberîya hemû eşîrên Êzîdîyan bigire ser xwe. Bi kesayetiya xwe ya bi hêz û wêrek, bandorek mezin li rêveberên Osmaniyan dibe. Ew ne tenê eşîra xwe, di heman demê de herêmekê birêve dibe. Meyan Xatûn di dîrokê de yekemîn jina Êzîdîye ku dibe Mîr û rêveberîya herêmekê dibe.

Meyan Xatûn jineke polîtîk û xwedî hêzeke ramanî bû.

Ew di salên 50'î yê sedsala borî de bi roleke girîng radibe û di parastina hebûna gelê Kurd de rol dilîze. Nemaze dema ku dewleta Osmanî Kurdên Êzîdî neçarê guhertina ol dike, Meyan Xatûn li hemberî van êrîşan derdikeve û roleke girîng di birêveberîna eşîr û êlên Êzîdîyan de dilîze.

Ew ji bo civaka Êzîdîyan mînakê herê baş, li pêş û balkêş bû. Li gel ku neçûbû dibistanê, xwedî û nivîsandina wê nînbû, lê rojeva cîhanê baş dişopand, di derbarê guhertin û veguhertinên di cîhanê de rû didin de xwedî agahî û têgihiştî bû. Li gor wê zanebûna xwe gelek caran bi dîplomaten Brîtanîyayî û yên din re karê dîplomasiyê birêve dibir, bi wan re hevdişîtan pêk tanî.

Dem dema Osmaniyan e, siltanê wê demê jî Ewdilhemîd e. Li herêmê gelek mîsyonerên Ewrûpî û Îngîlîz hene ku di nav hewldana nasîna ol, bawerî û çanda Êzîdîyan in, dixwazin di nav wan de xiristiyantiyê belav bikin. Ji xwe gelek ji wan mîsyoneran ji bo cara ewil e ku bi ola Êzî-



diyan hesiyane, ev yek jî dibe sedem daku carekedin herêmê lîbikolin. Bi demê re pirtûka pîroz ya Êzîdîyan "Misheva Reş" jî bala wan dikîşîne; ji xwe tê gotin ku hin ji wan jî ji bo ku pirtûka pîroz a Êzîdîyan bi dest bixin û bibin welatê xwe, di nav hewldanan de bûne.

Fermana qirkirinê didin

Hemû hewldanên Osmaniyan jî ew e ku Êzîdîyan bînin ser ola misilman an. Armanca wê yekê jî bi hêz kirina desthilatdarî û kotrola herêmê a ji aliyê wan e. Ji bo wê jî li pey tunekirin, wendakirin û şewitandina belgeyên ku di ola Êzîdîyan de pîroz in. Yan dest didaynin ser cihên pîroz, yan jî wêran dikin. Osmanî bi sedan fermanan ji bo qirkirina Êzîdîyan didin. Bi deh hezaran kesên aligirê ola Êzîdî tîrî qetilkirin. Sirgûn, koça bidarê zorê, girtîgeh, talan, keder û keser zêde dibin. Di demê wiha de ku fermana qirkirina Êzîdîyan tê dayîn de, di nav hin êlên Êzîdîyan de jî nakokî rû dide. Beşek jî Êzîdîyan ji ber zilmê dibin misilman, hin ji wan jî dibin xiristîyan. Lêbelê car bi caran, bi taybetî dema ku li herêmê aramî serwer dibe, Êzîdî dîsan vedigerin ser ola xwe û ligor bawerîya xwe dijîn.

Meyan Xatûn, jina serhildêr jî di demê wiha de jiya ye, kar û barên xwe birêve birîye. Ew bi herkesekê ku di nav danûstandin û têkiliyan debû, bi sebir tevdiqerî. Çi Osmanî, çi jî Ewrûpî û Emerîqî; Meyan Xatûn dizanî ka çawa û bi kîjan rê û rêbazê nêz bibe, têkiliyan deyne. Ew hertim bi sebrê mezin, lê bi şik nêzî biyanîyan bûye. Qasî ku bi sebr tevdiqerî ewqas jî bi taktîk nêz dibû.

Êlên Êzîdîyan birêve dibe

Hevserê Meyan Xatûn Mîr Elî Beg di sala 1913'an de bi awayekî nediyar tê kuştin. Ji ber ku lawê wê Seîd Beg hîn pîr biçûk e, birayê wê Îsmail Beg dixwaze bibe Mîr, lê-

belê Meyan Xatûn destûr nade wê yekê û wekaleta mîrtiya Seîd Beg di dest xwe de dihêle heta ku ew mezin bibe. Ji xwe dovre, di sala 1934'an de Meyan Xatûn Mîr Seîd Beg bi qîza birayê xwe Îsmail Beg a bi navê Wansayê re dizewicîne. Wansa di sala 1929'an de, di dibistana Beyrûtê de beşa hekîmîyê dixwîne. Li gor hin belgeyên Îngîlîzî ku di derbarê Wansayê de hatiye nivîsîn, tê gotin Wansa wek jina pêncan a Seîd beg di sala 1934'an de, dizewice. Wansa piştî salekê keça xwe Leyla tîne dinyayê ku dovre dimire.

Di sala 1938'an de, Seîd Beg beştarî civînekê ku birayê Wansayê Yezdîxan Beg bi komplogeriye tê sêçbar kirin û biryara kuştina wî tê dayîn, dibe. Di navbera Mîr û birayê Wansayê de nakokî derdikevin. Mîr Seîd Beg biryara kuştina Yezdîxan Beg digre. Wansa dema ku wê biryarê dibihîse, dest tavêje çekê û hevserê xwe birîndar dike. Di nav tevliheviyê de, ajokarê wê yê Ermenî Hagop ku ji aliyê babê Wansayê Îsmail ve tevî malbata wî hatibû rizgar kirin, tê xilas kirin û li Musilê, dovre jî bi alikariya wî Wansa dikare bireve û biçê Bexda yê.

Mîr Seîd Beg di sala 1944'an de diçe ser dilovaniya xwe. Bi mirina Mîr re, hewceyê Mîrê nû bê hilbijartin. Ji Mîr Seîd Beg û jina wî ya din Xoxê kurek bi navê Tehsîn heye. Tehsîn Beg hîn biçûk e û Meyan Xatûn wekaleta Mîrtiya wî jî digire ser milê xwe û dîsan biryara birêve birinê dide. Ew kar û barên herêmê, dîsan êlên Êzîdîyan bi hosteyî birêve dibe.

Serkeftina di rêvebirinê de

Meyan Xatûn ji ber jêhatîbûna xwe a di rêvebirinê de, rêberê baş, di kêliyên herê bi tehlûkêde jî xwedî sekneke wisa bû ku dikarî biryarên erênî bistîne. Ji ber wesfa xwe a rêbertiyê, kar û barên Mîrtiyê gihand asta herê jor. Ji ber wê nêzikatiya wê, gelê wê hertim jê re rêz raber dikir, di nav civakê de xwedî bandorek pîr mezin bû. Bandorek wisa ku heya niha kesê nekariye di nav civakê de bide çêkirin. Bi hebûna wê bextewar û bi rûmet, di nebûna wê de jî tune dibûn.

Leşkerek Osmanî yê bi navê Sadiq Damlukî wê di sala 1949'an de, di derheqê Meyan Xatûnê de wiha binivîsa: "Temenê Meyan Xatûn niha 75 e. Lê, min ew di ciwantiya wê de dîtibû. Jinek wêrek, xweşik, ciwan û çeleng bû. Bi mirina hevserê xwe Mîr Elî Beg re, ji Mîr Seîd Beg û Mîr Tehsîn Beg re wekaletiya mîrtiyê kir. Meyan Xatûn û Mîr Elî Beg ji bo 3 salan sirgûnê bajrê Sêwasê hatin kirin. Meyan Xatûn wek her car jî, aqilmend û pêşeroj baş didît û dinirxand. Ew di nav civaka xwe de xwedî paye û ciheke girîng bû. Gel ne ji ber ku jê ditirsîna na, ji ber ku jê re rêz raber dikirin, jê hez dikirin. Tu kesekê cisaret nedikir ku li hemberê wê derkeve. Dema ku ew di nav gel de nebûya, gel diket nav xem û hizran. Ew xwedî keseyetek xurt û bi esil bû. Meyan Xatûn zû bi zû bawerî bi kesê netanî, bi şik nêzî kes û bûyeran dibû. Ya dibexşand, ferman dida, heta hin cihan dema pêwîs baya, ya ku dikuşt dîsan Meyan Xatûn bi xwe bû."

Meyan Xatûn, jina serhildêr a ku wiha hevok ji bo wê dihatin rêz kirin, di 31'ê Hezîrana sala 1957'an de, di 83 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Ew jî wek gelek jinên wêrek û serhildêr cihê xwe di nav rûpelên dîroka qehrimantiya jina Kurd de girt.

